

JI ALİYÊ TÊKILIYÊN NETEWPERWERÎ Û ÇÎNÎ VE ANALÎZKIRINA ROMANA PÊŞMERGE: XEBATEK SOSYOLOJİYA EDEBİYATÊ

PÊŞMERGE ROMANIN MİLLİYETÇİLİK VE SINIF İLİŞKİLERİ AÇISINDAN İNCELENMESİ:

BİR EDEBİYAT SOSYOLOJİSİ ÇALIŞMASI

AN ANALYSIS OF THE NOVEL PÊŞMERGE IN TERMS OF NATIONALISM AND CLASS
RELATIONS: A STUDY OF THE SOCIOLOGY OF LITERATURE

Mehmet Şirin Filiz*

Kurte

Ev xebat di çarçoveya sosyolojiya edebiyatê de hewl dide romana Rehîmê Qazî Pêşmerge ku di sala 1960an de hatiye weşandin ji aliyê t êkiliyên netewperweriyê û çînî ve analiz bike. Li gor sosyolojiya edebiyatê metneke edebî b êyî şertê mercên ku metn t ê de ava bûye nikare were nixandîn. Lewra metn bixwe fenomeneke civakî ye. Ji ber v ê yekê herçend di nav sosyolojiya edebiyatê de nêrînên cuda hebin jî tiştê hewpar ew e ku ji bo fêmkirina metnekê divê hem analîza navxweyî hem jî analîza derveyî ya metnê were kirin. Ji ber v ê yekê ev xebat pêşî li ser t êkiliyên di navbera netewperweriyê û t êkoşîna çînî de disekine û hewl dide analîz bike ka gelo kîjan pêvajoyên dîrokî û civakî bûne sedem ku ev roman were nivîsandîn. Paşê jî analîza navxweyî ya metnê dike û hewl dide t êkiliyên netewperweriyê û yên çînî analîz bike ku di nav metnê de hene. Di encamê de hatiye dîtin ku di navbera gotara metnê û rastiye civakî de ji hin aliyan ve lihevhatinek hebe jî ji ber şert û mercên serdemê û îdeolojiya nivîskar ji hin aliyan ve jî nakokî hene.

Bêjeyên Sereke: Komara Mahabadê, Netewperwerî, Çîn, Romana Pêşmerge

Öz

Bu çalışma edebiyat sosyolojisi tartışmalarına dayanarak Rehîmê Qazî'nin 1960 yılında yayımlanan Pêşmerge romanını milliyetçilik ve sınıf ilişkileri açısından incelemeyi amaçlamaktadır. Edebiyat sosyolojisi açısından bir metin içinde üretildiği toplumsal şartlardan bağımsız olarak değerlendirilemez; çünkü metnin kendisi toplumsal bir olgudur. Bu alanda farklı eğilimler olmakla birlikte genel olarak bir metnin hem iç hem dış analize tabi tutulması gerektiği noktasında ortaklaşma vardır. Bu nedenle çalışma ilk olarak milliyetçiliğin sınıf mücadelesi ile olan ilişkileri üzerinde durarak Pêşmerge romanının yazılmasına neden olan tarihsel ve toplumsal süreci analiz ediyor. Daha sonra da romanın iç analizini yaparak metnin içinde var olan milliyetçi düşünce ve sınıfsal ilişkileri analiz etmektedir. Sonuç olarak görülmüştür ki metin ile toplumsal gerçekler açısından bazı noktalarda uyum vardır, dönemin koşullarından ve yazarın ideolojisinden kaynaklı bazı noktalarda ise uyumsuzluklar vardır.

Anahtar Kelimeler. Mahabad Cumhuriyeti, Milliyetçilik, Sınıf, Pêşmerge Romanı

Abstract

This study aims to analyze Rehîmê Qazî's novel Pêşmerge published in 1960 in terms of nationalism and class relations based on the discussions in the sociology of literature. In terms of the sociology of literature, a text cannot be evaluated separately of the conditions in which it is produced because the text is a social phenomenon. Although there are different tendencies in this field, there is a general consensus that a text should be subjected to both internal and external analysis. Therefore, the study first analyzes the historical and social process that led to the writing of the novel Peshmerge by focusing on the

* Dr. Mehmet Şirin Filiz, Mardin Artuklu Üniversitesi, Türkiye'de Yaşayan Diller Enstitüsü, Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı, e mail, mehmetsirinfiliz@gmail.com , ORCID: [0000-0003-0622-5510](https://orcid.org/0000-0003-0622-5510)

relationship between nationalism and class struggle. Secondly, it analyzes the nationalist thought and class relations that exist within the text through an internal analysis of the novel. As a result, while there are some points of harmony between the text and social realities, there are some points of incompatibility due to the conditions of the period and the ideology of the author.

Keywords: Mahabad Kurdish Republic, Nationalism, Class, Pêşmerge Novel

DESTPÊK

Di van salên dawî de li ser têkiliya edebiyatê û netewperweriyê gelek xebat hatine kirin. Di van xebatan de ev îdeolojî bi awayeke giştî û weku îdeolojîyeke sabît û stabîl e tê sewirandin, lê beravajî vê yekê ew di nav xwe de gelek nakokîyan dihewîne û îdeolojîyeke herikbar e. Ew li ser hin nasnameyan ava dibe, lê di nav demê de van nasnameyan jî diguherîne û watayên nû li van nasnameyan bar dike (Calhoun, 2007, r. 68). Hin caran jî bi îdeolojiyên wekî liberalîzm, sosyalîzm, totalîterîzm û faşîzmê re hevalbendiyê dike û vediguhere (Miller, 1995, r. 2-4). Ji ber van yekan, weku Watson (1977, r. 5) jî nîqaş dike ku em bi awayeke zanîstî pênaseya vê îdeolojiyê nikarin bikin; çimkî ev îdeolojî li deverên cuda yên cîhanê di nav pêvajoya dîrokî de form û teşeyên cuda digire. Li gor Hobsbawm (2010) jî netewperî ne diyardeyeke stabîl û xwezayî ye, berevajî ew bi rêyên endazyerîya civakî tê avakirin (r. 24-25).

Heger em behsa rehên vê îdeolojiyê bikin bêgûman netewperwerî çavkaniya xwe ji şoreşa Frensî stendibû û ji wir li deverên cuda berbelav bibû, lê li van deveran form û teşeyên nû girtibû. Ew heya Şerê Cîhanê yê Duyemîn jî di nav jiyana gelan de roleke sereke lîst (Carr, 1990, r. 31). Netewperweriyê di serdema şoreşa Fransayê de pêşveçûn û modernîteyê temsîl dikir, lê di destê Naziyan regekî totalîter û faşîst stand. Dema ku di nav gelên cihana sêyemîn de berbelav bû xwedî gotareke antî-emperyalîst wergirt (Hobsbawm, 2010, r. 130). Chatterjee (1993) di nav vê çarçoveyê de dibêje ku netewperwerî li Ewropayê li ser bingeha aqil, sekûlerî û modernîzasyonê ava bibû, lê di nav gelên cihana sêyemîn de bêtir li ser nirxên çandî xwe ava kir û di mobîlîzasyona van gelan de roleke sereke lîst (r. 18). Ji ber ku Sovyet piştgiriya tevgerên rizgariyê yên van gelan dikir, ew bi gelemperî di bin bandora felsefeya lenînîst de mabûn (Said, 2016, r. 309). Lenînîst herçiqas netewperweriyê weku îdeolojiya burjûvaziyê pênase bikin jî wan jî baş dizanibû ku di rizgarkirina van gelan de netewperwerî xwedî hêzekê bû. Lewra tevgerên neteweyî yên vê serdemê piştî xwe hem didan netewperweriyê hem jî şerê çînî; çimkî li gor wan têkoşîna azadiyê bêtir şerê çînî nikaribû biçûya serî.

Di nav vê pêvajoya dîrokî de gelo rewşa Kurdan çawa bû? Li gor Kedourie'ye (1961) netew dema ku kesên xwedî vîneke azad têne ba hev derdikeve holê; lewra li gor îdeolojiya netewperweriyê divê her gel qedera xwe bi vîneke azad bi dest bixista (r. 31). Lê ji bo kurdan

dîrok rê nade ku ew bi vîneke azad li ser qedera xwe biryar bidin, ev jî rê da ku netewperweriya kurdî geş bibe; lê netewperweriya kurdan jî wekî netewperweriya gelên din ne sabît û stabîl bû. Ji gelek pêvajoyên dîrokî yên cuda derbas bû, guherî û rengên cuda stand (Edmonds, 1971, r. 89). Di nav vê çarçoveyê de Esposti (2022) tevgera netewperwer ya kurdan li gor hin serdeman dabeş dike. Li gor wî serdema yekem salên di navbera 1918-1946an de ye ku ew vê serdemê weku netewperweriya feodal bi nav dike. Serdema duyem salên di navbera 1946-1991an de ye ku ew dibêje di vê serdemê tevgerên dijkolonyal û çînî zêde derketin pêş ku ev serdem beranberî bilindbûnê û têkçûna Komara Mahabadê tê. Bi rastî jî avabûna Komarê ji bo netewperweriya kurdî momentek bû, ji bo vê jî Qazî Mihemed di wê baweriyê de bû ku bi saya Komarê kurd ji xewneke sedan salên berdewam şîyar bibûn (Aegleton, 1989, r. 154-156). Herçend di avakirina Komarê de gelek çînên civakî hebin jî ew ji Îbrahîm Ehmed neqil dike û dibêje ku Qazî gotiye: “Tecrûbeyî Mahabadê hîne me kir ku divê em tu carî rê nedin ku serok eşîr bibin serokê tevgerên azadiyê.” (Vgz. Esposti, 2022, r. 44). Bi rastî jî di wan deman de di nav kurdên Iraq, Tîrkiye, Îran û Suriyê de tevgerên sosyalîst berbelav dibûn. Ligel vê yekê Komar di nav kurdan de bû semboleke giring ya serxwebûnê. Di nav vê çarçoveyê de li ser Komarê gelek kesan xebatên akademîk jî kirin ku yek ji wan jî Rehîmê Qazî ye. Ew mirovê Qazî Muhammed bû, li gundê Gwigceliyê li Rojhilatê Kurdistanê hatibû dinê. Komar digel 60-70ê kesî ji bo perwerdeyê ew şandibû Bakûyê, wî li vê derê li zanîngeha Kirov beşa dîrokê qedand û di Sala 1954an de teza xwe ya doktorayê bi sernavê “Tevgerên Azadiya Kurd û Qazî Mihemed” kir, demek mamostetî kir û bi navê Kurdistan rojnameyek derxist. Digel xebatên akademîk li ser Komarê, romanek di derbarê pêvajoya avabûna Komarê de bi navê Pêşmerge jî nivîsand. Ev roman cara yekem di sala 1960an de li Erîvanê çap bû (Qazî, 1997, r. 6). Di vê romanê de wî behsa şert û mercan kir ku Komar tê de avabûye. Lêbelê gelo tezên ku di vê romanê de pêşkêş dikir û rastiyên dîrokî û civakî çiqas li hev dihatin, ew arîşeyeke giring e. Ji ber vê yekê armanca vê xebatê çareserkirina van arîşeyan e. Ji bo çareserkirina vê problemê jî ew ê berê xwe bide nîqaşên sosyolojiya edebiyatê û pêşî hewl bide paşxaneyê sedemên civakî û dîrokî yên ku Komarê ava kirine analîz bike û paşê jî ew ê berê xwe bide analîza naverokî ya romana Pêşmerge û hewl bide têkiliyên çînî û netewperwerî yên ku di romanê de hene derxe holê. Lê beriya vê yekê divê behsa mahîyeta sosyolojiya edebiyatê were kirin.

1. Sosyolojiya Edebiyatê: Metn, Nivîskar, Civak,

Sosyolojiya edebiyatê di xebatên edebî de dîsîplîneke nû ye û ji ber vê yekê jî hêj nikare bersiva hin pirsên derbarê edebiyatê bide; çimkî dema ku mirov bibêje ka gelo berhema edebî çi ye, em ê rastî bersivên gelek cuda werin. Bo nimûne di vê mijarê de hin kes wê bibêjin berhema edebî

hilberîneke şexsî ya nivîskar e, hin kes wê bibêjin berhema edebî fenomeke serbixwe ye û hin kes jî wê bibêjin berhema edebî nîşaneya hişmendiya civakê ye; lewra ew bi xwe diyardeyeke civakê ye. Herçend em li derdora van nîqaşan nikaribin bigihêjin encameke têkûz jî mirov dikare bibêje ku sosyolojiya edebiyatê di nîrxandinên civakî yên derbarê berhema edebî de amûreke bikêr e (Kösemiş, 2014, r. 5). Ji ber ku gelek kesên ku bi awayekî akademîk bi sosyolojiya edebiyatê ve eleqedar in di wê baweriyê de ne ku edebiyat rasterast rewşa civakê nîşan dide (Şatıroğlu, 2012). Di vî warî de cara yekem Mme de Staël bi pirtûka xwe ya bi navê *Toplumsal Kurumlarının İlişkisi İçinde Edebiyat* (Di Nav Pêwendên Têkiliyên Civakî de Edebiyat) bal kişand têkiliyên di navbera civak û edebiyatê de (Escarpit, 1992, r. 10). Nîqaşên ku li ser têkiliyên di navbera edebiyat û civakê de paşê bû sedem ku wek qadeke serbixwe sosyolojiya edebiyatê derkeve pêş. Li gor sosyolojiya edebiyatê, edebiyat ne tenê hilberînek şexsî an jî civakî ye, di heman demê de edebiyat bandor li civakê dike û heta di hin peywendan de civakê diguherîne. Bo nimûne roman wekû cûreyeke edebî ya civaka endustriyel di avakirina civak û insanê nû de roleke sereke lîst (Laurensen û Swingewood, 1972, r. 12). Anderson (2006) jî bal dikişîne li ser van yekan û dibêje roman jî ber ku zimanek sade bi kar dianî û xitabî girseyên mezin dikir; lewra di avakirina neteweyan de roleke sereke lîst. Nivîs bi taybetî jî cihên weku Îngîlterê di sedsala 19an de ji bo çîna bîndest roleke sereke lîst, wê bi xêra edebiyatê li hember nîrxên burjûvaziyê nîrxên alternatîf ava kir (r. 24-25). Di vê serdemê de edebiyat şûna dîn girtibû, wê jî wekû dîn dikaribû di navbera îngîlîzan de hevpariyeke hestan ava bikira (Culler, 2007, r. 57)

Bêgûman di nav edebiyat û civakê de têkiliyeke xurt hebû. Lê mirov dikare bibêje ku sosyolojiya edebiyatê di navbera edebiyat û sosyolojiyê de li cihekî disekine. Zanistên civakî di wê baweriyê de ne ku edebiyat tecrûbeyeke şexsî ye, ji aliyê zanistî ve nikare were analîzkirin; di heman demê de rexnegirê edebî jî îdia dikin ku edebiyat xwedî sistemeke xweser e. Lewra edebiyat divê li gor sistema xwe were analîzkirin. Sosyolojiya edebiyatê dijberî van baweriyên derdike û dixwaze di navbera zanistên civakî û edebiyatê de pîrekê ava bike; çimkî ji bo fêmkirina metnê bi qasî analîzên navmetnî analîzên sosyolojîk lazim in (Laurensen û Swingewood, 1972, r. 11). Di nav vê pêwendê de kesên weku Pincott (1970) îdia dikirin ku metneke edebî jî pir bi hêsanî dikaribû bibûya dokumenteke sosyolojîk. Bi gotinek din em li ser metneke edebî dikarin xwendineke sosyolojîk bikin; lewra metn ne tenê hilberîneke şexsî bû, ew di heman demê de fenomeke civakî bû (r. 177). Di nav vê çarçoveyê de îdiaya sereke ya sosyolojiya edebiyatê ew bû ku di navbera sosyolojî û edebiyatê de wekû ku tê îdiakirin sînorên zexm tunene. Herdu jî çavdêriyên civakî dikin; lê dema ku vê dikin bi şêweya xwe dikin.

Edebiyat çavdêriyên xwe bi zimanê estetîk û sosyolojî jî bi zimanê sade dike. Ji vî aliyê ve em bifikirin di rastiya xwe de metneke edebî di heman demê de metneke sosyolojîk e (Vána, 2020). Pincot (1970) ji bo vê îdiaya xwe piştrast bike dibêje ku romaneke ku serdema Naziyan de hatibe nivîsîn hem berhemeke edebî û hem jî metneke sosyolojîk e. Lewra ew çavdêriya serdemekê dike û di navbera wê û metneke sosyolojîk de tu ferq tune ye (r. 177). Herweha kesên weku Hoggart (1966) pêşdetir diçûn û digotin; edebiyat derbarê bûyerên civakî de ji zanistên civakî bêtir dikare civakê teswîr bike. Di nav nîqaşan de mirov dikare bibêje ku rolên sereke yên sosyolojiya edebiyatê ev in:

- Karakterên xeyalî yên ku nivîskar ava kirine bi atmosferên dîrokî yên ku ew karakter tê de ava bûne divê werin peywendîdarkirin,
- Temayên sereke yên metnê bi rastiyên dîrokî û civakî ve divê werin girêdan û
- Wataya bingeîn ya metnê jî were derxistin (Laurenson û Swingewood, 1972, r. 14-16).

Lê divê were gotin ku wataya metnê tenê ji mebesta nivîskar, ji xwendinên nav metnê jî dernakeve holê. Ji bo ku wataya metnê were fêmkirin herçend ev bi kêr werin jî tiştê bingeîn ew e ku şert û mercên dîrokî û serdema ku metnê dorpêç kiriye werin vekolîn; lewra metn bixwe encama pêvajoya van yekan e. Sosyolojiya edebiyatê ji vî aliyê ve li ser konteksê hûr dibe. Divê were gotin ku sosyolojiya edebiyatê tenê bi peywenda metnê bi civakê re eleqedar nabe. Di heman demê de bi pîrsgirêkên wekî; têkiliya metnê bi xwîner çî ye, bi weşandin û berbalavbûna pirtûkan re, rola nivîskar di nav civakê de çî ye û gelek problemên curbecur re eleqedar e (Escarpit, 1992). Ji ber ku ez ê di vê xebatê de li ser van yekan neseke min cîh neda van probleman. Lê konteks jî di nav sosyolojiya edebiyatê de pîrsgirêk e, gelo konteksê baş ku li metnê rûdine çî ye? Marksîst ew ê bibêjin konteksê komên civakî û çînî ne û netewperwer jî ew ê bibêjin konteksê edebiyata netewî ye (Sapiro, 2019, r. 13-14). Di nav vê çarçoveyê de divê em bibêjin ku sosyolojiya edebiyatê ji nav edebiyata marksîst derket holê. Bi taybetî jî bi saya nêrînên George Lukács bû xwedî sistemeke hevgirtî. Piştî wî jî kesên weku Roland Barthes jî perspektîfên nû anîn sosyolojiya edebiyatê (Escarpit, 1992, r. 14). Lê bi vê xebatê ve peywendîdar divê mirov behsa nêzikahiyên marksîst yên di nav sosyolojiya edebiyatê de bike.

Di nav rexnegirên Marksîst de kesê yekem Georgi Plekhanov (1967, r. 23-27) bû. Li gor wî berhemên hunerî jî ji hêla şert û mercên civakî dihatin afirandin; lewra berhemên edebî hişmendiya civakî nîşan didan. Lê mirov dikare bibêje ku herî zêde Lukács (2014, r. 94) bi nêrînên xwe di pêşvebirana sosyolojiya edebiyatê de roleke sereke lîst. Li gor wî roman epîka cîhaneke nû bû ku Xweda terka vê derê kiribû. Di bingeha vê dinyayê de jî takekesbûn û sekûlarîzasyon hebû. Lewra li gor wî di epîka kevin de dinyayeke hevgirtî hebû; lê bi saya

romanê ve ev cihana hevgirtî xera bibû. Romannûs hewl dida cîhana kevin xera bike û cîhaneke nû ava bike. Bi vî awayî wî bal dikşand aliyê civakî yê romanê, li gor wî roman ne ku tenê di bin bandora civakê de dima di heman demê de wê cihana heyî jî diguherand. Piştî Lukács nêrînên Goldmann (1998, r. 148-149) jî di nav sosyolojiya edebiyatê de giring in ku ew jî ji ekola Marksîst bû û peyrewê Lukács bû. Li gor wî berhema edebî dema ku şert û mercên ku ew tê de ava bûye baş dest nîşan bike dibe berhemeke serkeftî û tenê berhemên bi vî rengî layiqê nirxandinên edebî ne. Ew di berhema xwe ya bi navê Sosyolojiya Romanê (Roman Sosyolojisi) de fikrên xwe hinek din zelal dike û dibêje: Afirînerê berhemeke edebî ne nivîskar e, ew kirdeyeke kolektîf e; ango berhemeke edebî hilberîneke pêvajoyeke dîrokî û civakî ye. Lewra berhem ne ji hêla kesekî ve ku em jê re dibêjin nivîskar tê nivîsandin, ew ji hêla komekî civakî ve tê hilberandin (Goldmann, 2005, r. 13).

Piştî Goldmann kesên weku Williams (1990) jî tevkarî van nîqaşên li ser sosyolojiya edebiyatê dibe. Li gor wî di analîzên edebî de ne tenê pêvajoyên aborî, di heman demê de hemû pêvajoyên dîrokî û civakî bibandor in (r. 109). Herçend metn bi tevahî weku tiştekî îdeolojîk neyê dîtin jî edebiyat parçeyê dîrok û civakê ye (r. 41). Di nav nîqaşên marksîst de nêrînên cuda hebin jî xala hevpar ew bû ku berhemeke edebî encama hilberîna şert û mercên dîrokî ye; lê divê bê destnîşankirin ku metna edebî van şert û mercan rasterast venabêje ew rastiya civakî li bêjîngekê dixê, bi gotîneke din ji çavê nivîskar derbas dike û wiha pêşkêş dike. Ji ber vê jî bi giştî li gor marksîstan edebiyat heqîqetê rasterast venabêje û divê heqîqet ji çavên bindest û hêjara ve were dîtin (r.78). Lewra li gor Eagleton (2014) metneke edebî rasterast bi îdeolojiyan ve girêdayî ye (r. 30). Em van yekan di nav edebiyata Sovyetê de dibînin ku ew bi propagandayên îdeolojîk tije bû. Di nav vê çarçoveyê de edebiyata kurdî ya Sovyetê jî ji van yekan ne xalî bû, ew jî bi propagandaya sîstema Sovyetê ve tijî bû (bnr. Ergün, 2023).

Di sosyolojiya edebiyatê de herçend gotara marksîst desthilatdar be jî hin nêrînên cuda jî hebûn. Li gor Eagleton (1998) bi giştî du nêrînên sereke hebûn di sosyolojiya edebiyatê de: Nêrîna yekemîn ya kevnare bû ku îdia dikir ji bo metn were fêmkirin divê li şert û mercên dîrokî bihata nihêrtin, nêrîna duyemîn bêtir sofîstîke û pragmatîk bû. Li gor vê nêrînê ji şert û mercên civakî wêdetir gelek tiştên din jî hene ku bandor li wataya metnê dikin. Lê li gor Eagleton kêmasiya van herdu nêrînan jî hebû. Vê taliyê sosyologê navdar Bourdieu (1995) jî tevli nîqaşên sosyolojiya edebiyatê bû. Li gor wî xwendinên derveyî metnê û yên nav metnê ne mecbur in ku dijberî hev bin; beravajî vê yekê herdu xwendin jî alikariya hev dikin. Wî rêbaza xwe li ser Flaubert bi kar anî û encamên baş derxist holê. Lê divê were gotin ku herçend Bourdieu bal bikişîne li ser têkiliyên nav metnê û civakê jî li gor Eastwood (2007) hin kêmasiyên vê teoriyê

jî hene; lewra di her şert û mercan de rastiyên civakî û rastiyên metnê ne wekhev in. Bi gotineke din metn sedîsed ne neynika civakê ye. Lewra di xwendina wî ya derbarê Flabuert de jî gelek kêmasî hebûn. Ji ber ku di fêmkirina metnekê de jî bîlî şert û mercên civakî, îdeoloji û psîkolojiya nivîskar jî bandor li watayê dikan.

Di dawiyê de mirov dikare bibêje ku di sosyolojiya edebiyatê de nêrînên cuda hene û her yeke nû derdikeve. Tevgerên netewperwer rê dan ku nêrîneke nû derkeve di navbera edebiyat û nasnameyê de. Xebatên bi vî rengî rê didin ku çawa edebiyat di avakirina nasnamayê de roleke sereke dilîze (Griswold, 1993, r. 464). Di nav vê çarçoveyê de mirov dikare bibêje ku sosyolojiya edebiyatê bi taybetî jî di xwendinên li ser nasnameyê de amûreke sereke bû. Ji ber vê yekê ye wekî ku Sapiro (2019 r. 97- 98) jî nîqaş dike, ji bo fêmkirina edebiyata perîferîk, ango edebiyata penaberan tenê analîzên navmetnî têr nakin; di heman demê de divê mirov analîzên sosyopolîtîk jî bike (r. 97-98). Edebiyata kurdî jî kêr zêde edebiyatek e ku bi nasnameya ve eleqedar e; lewra ji bo xwendinên li ser vê edebiyatê jî xwendinên sosyopolîtîk divê. Lewra ji bo fêmkirina wataya metnekê tenê analîzên navxweyî têr nakin, digel analîza navmetnî analîza şert û mercên dîrokî û civakî divê were kirin. Li derdora van nîqaşan ji bo romana Pêşmerge were fêmkirin di çarçoweya sosyolojiya edebiyatê de divê şert û mercên dîrokî û civakî yên ku vê berhemê hilberandine werin analîzkirin.

2. Di navbera Netewperwerî û Çînê de Ber bi Komara Mahabadê ve

Netewe çi ye? Yekitiyek polîtîk an jî komeke etnîk ku ji hêla ziman û çandê ve bi hev re hatiye girêdan e? Tişteke xwezayî ye an jî ji aliyê saziyên polîtîk ve tê avakirin? Li gor Canovan (1996) netewe diyardeyeke gelek tevlihev e; lewra gelek diyardeyên cuda di avabûna neteweyê de bi awayên cuda be jî rol dilîzin (r. 69). Lê mirov dikare bibêje ku herçend gelek cureyên cuda yên netewperweriyê hebin jî li gor Habermas (1994) du cureyên giştî yên netewperweriyê hebûn: yek etnîk û ya din jî hemwelatîbûn (civic) bû. Netewperweriya etnîk ya almanan bû û ya hemwelatîbûnê jî ya frensiyan bû; çimki li vir netewperwerî ji etnîsîteyê bêtir bi hemwelatîbûnê ve girêdayî bû (r. 146). Kohn (1982) jî bal dikişîne li ser vê cudabûnê û dibêje çavkaniya netewperweriyê bêguman Ewropa bû û di bingeha wê de rewşenbîrî, aqil û sekûlerî hebûn. Ew cure netewperwerî li ser piştî burjûvaya liberal ava bibû û di pêşvebirina mafên mirovan de roleke sereke lîst. Netewperwerî, dema ku piştî şerê Napolyon li Ewropayê berbelavî deverên din bû, formeke etnîk girt (r. 29-30). Ev forma etnîk hin caran weku li Almanya pêk hat veguhêst faşîzmê û renekî nijadperest girt. Weku ku serdema Hîtler jî derket holê ji bo ku Almanyayeke xwerû ava bibûna divê hemû cihû bihatana qirkirin (Rattanasi, 2007, r. 6). Helbet çawa ku netewperwerî ji bo almanan bibû îdeolojiyek sereke û veguhêstibû nijadperestiyê di

heman demê de ev îdeolojî ji bo cihûyan jî bibû motîvasyoneke polîtîk. Cihû li nasnameya xwe ya etnîk hesiyan û digotin ji bo em xwe ji tunebûnê xilas bikin divê em vegerin li ser erdnigariya xwe ya dîrokî. Vê hişmendiye di avakirina nasnameya wan ya neteweyî de roleke sereke lîst (Gans, 2003, r. 99-101).

Ji bilî cihû almanan di rastiya xwe de di salên 1940î û 1950an di nav gelên cihana sêyemîn de netewperwerî roleke sereke lîst (Said , 1993, r. 73-74). Motivasyona sereke ya şerê li hember emperyalîzmê netewperwerî bû; çimkî tenê vê îdeolojiyê dikaribû di avakirina nasnameyeke netewî de roleke sereke bilîsta (Loomba, 2000, r. 212). Ev rewş bû sedem ku netewperweriya antî-kolonyal bi pêş ve bikeve. Li gorî gotara antî-kolonyal divê otoriteyên kolonyal ji holê bihata rakirin (Ashcroft, Griffiths û Tiffin, 2013, r. 15). A rast di avakirina netewperweriya antî-kolonyal de sosyalîstên ewropî jî arikarî dan gelên cihana sêyemîn (Memmi, 2003, r. 74-75). Lê ne tenê sosyalîstên ewropî di heman demê de weku berê jî hate gotin weku hêzeke mezin Sovyet jî alikariya van gelan dikir. Herçend armanceke veşartî ya Sovyetê hebe jî îdeolojiya lenînîst ji bo piştgiriya van gelan musaît bû. Bo nimûne li gor Lenin (1992) erka marksîstekê parastina hemû karkerên cihanî û têkoşîna li hember netewperweriya burjûva bû. Marksîstekî rûs nikaribû çanda neteweyî biparasta; berevajî divê ew li hember vê çanda burjûva bisekiniya û enternasyonalîzmê biparasta (r. 21). Li gor wî divê hemû gelan qedera xwe bi xwe diyar bikira. Dema ku van gelan biryarên xwe dan, peywira lenînîstan li kêleka wan li hember emperyalîstan şerkirin e. Dema ku lenînîstekê vê nekir, ew ne lenînîst e şovenîstek e; lewra weku Marks jî dibêje dema ku gelek zilm û zordestiyê li ser gelekî din bike ew gel jî nikare azad be. Bo nimûne dema ku karkerên Îrlandayî xwestin ku ji Îngiltereyê veqetin divê sosyalîstên îngilîzî jî alikariya wan bikin (Lenin, 1976, r. 112-113). Helbet tevahiya cihanê de rewş ne wekhev bû. Lê piranî lenînîst qet nebe bi peyvan jî be bîr û baweriyên Lenîn parastin. Bo nimûne li gor Stalin (1979) pirsgrîkên neteweyî ji gelek serdemên cuda derbas bûye, di serdema Lenîn de ev problem bêtir di derbarê gelên medenî de bû; lê niha ji Asyayê heya Efrîqayê gelek pirsgrîkên cuda di nav xwe de dihevin. Di nav ewqas probleman de gelên bindest ten dema ku piştî xwe bidin çîna proleter dikarin azadiya xwe bi dest bixin (r.69-71). Ji ber vê yekê ye ku di gotara tevgerên azadîxwaz de di navbera têkoşîna netewî û şerê çînî de hevalbendiyek ava bibû. Gelên bindest ji bin desthilatdariya dewletên kolonyal tenê bi alikariya Sovyetê re dikaribûn xwe xilas bikin. Jixwe rewşên bîrên antî-kolonyal yên wek Fanon (2009) jî di heman baweriyê de bûn, herçend ew paşê ji partiya komunîst veqetiya be jî digot ku di hin rewşan de hişmendiya çînî û hişmendiya netewî dikarin bi hev re hevalbendî bikin (r.149). Bi taybetî piştî Şerê Cihanî yê

Duyemîn tiştê ku di nav gelên cihana sêyemîn de diqewîmî ew bû. Gelo di nav vê pêvajoya dîrokî de rewşa kurdan çawa bû?

Divê destpêkê de were gotin ku li ser rûyê cihanê neteweyek homojen tune ye û gelek caran nasnameya neteweyî ji ber têkoşînên siyasî ji nav guherînan re derbas dibin (Miller, 1995, r. 40). Di nav vê pêwendê de mirov dikare bibêje ku nasnameya kurdan jî nasnameyeke parçekirî ye; lewra kurd ji hêla mezhep, zaravayan hatibûn parçekirin û civakeke têra xwe heterojen bû. Ev jî bû sedem ku netewperweriya kurdan jî di encama gelek bûyerên polîtîk de ji nav guherînan re derbas bibe (Bruinessen, 2005). Lê mirov dikare bibêje ku wekî ku Smith (1991, r. 124) jî nîqaş dike netewperweriya kurdî di destpêkê de netewperweriyeke etnîk bû; lewra kurd di nav xaka serdestan de mabûn û dixwestin bibin xwedî dewleta xwe. Ev cûre netewperwerî bêtir ji hêla kesên elît û rewşenbîr ve di hate meşandin (Smith, 1991, r. 64). Ew li paytextên mezin dijiyan û wan di nav bûrokrasiyê de cih digirtin. Ji ber vê yekê bêtir dikaribûn rewşa ku gelê wan di nav de ye fêr bikirana (Calhoun, 2007, r. 144). Netewperweriya kurdî jî ji heman pêvajoyan derbas bû. Özoğlu (2004) li ser van yekan disekine û dibêje ku netewperweriya kurdî pêşî ji hêla kesên wekî Bedirxaniyan, Nehriyan, Cemilpaşazadeyan, Şeyh Ubeydullah Nehrî û Mehmet Şerif Paşa ve di hate meşandin ku hemû endamên malbatên esilzade bûn. Ew li paytexta Osmaniyan dijiyan û daxwaza wan ya sereke ew bû ku kurd li ser erdnigariya xwe bibûna desthilatdar (r. 10-11). Weku Connor (1973) jî îfade dike jixwe ew daxwaza sereke ya netewperweran bû (r. 3). Ji bilî van kesên ku endamên malbatên navdar bûn gelek rewşenbîrên din jî hebûn; hinek ji wan kesan leşkerên kevnare û endamê Îttîhat û Terakkiyê bûn (Jwaideh, 2009, r. 267-268). Lê ev hemû kes jî kêmtir xwedî statûyeke civakî bûn

Ji ber gelek sedemên cuda ew nîfşê arîstokrat û asilzade ji holê wendabû û cihê vê nîfşê serokeşîr girtin ku yek ji wan jî Şêx Mehmûd bû. Di destpêkê de hem hikûmeta Iraqê û hem jî ya îngilîzan rêveberiya Şêx nas kirin; lê paşê di navbera Şêx û îngilîzan de nakokî derketin û Şêx mecbûr ma ku biçe Serdeştê (Minorsky, Bois û MacKenzie, 2004, r. 115-117). Digel ku Şêx serokeşîr bû jî wî hêvî û lava ji Sovyetê kiribû, arikariyan wan xwestibû. Balkêşê ku Cemil Saib “Di Xew De” behsa vê yekê dike. Ew jî devê şêx wiha vê bûyerê vedibêje: “Ez çend car bi îngilîzan re rabûm bi tirkan re têkçûmû min xwest ez bi Rusyayê û Bolşevîkan re peywendî deynim. Me ew qas xwîn rêt. Mine ew qas tişt tev bo xwe nekirin, min van hemiyan ji bo dîn û millet kirin.” (Saib, 2009, r. 49-50). Şêx bi rastî jî di sala 1923an de nameyek ji konsolosê rûsan ya li Tebrîzê dinivîse û dibêje di Şoreşa Cotmehê de cihanê dengê û hawara azadiyê bihîst, gelên bindest gihaştin azadiya xwe. Ew weku gelê kurd li hêviya arikariya Sovyetê ne da ku ew gelê hejar jî bigihêje azadiya xwe (Qasimlo, 1991, r. 75). Helbet divê li vir mirov behsa

serhildana Şêx Ubeydullah jî bike; lewra vê serhildanê jî di pêşketina nasnameya netewî ya kurdan de roleke sereke list. Heta li gor Vali (2010) vê serhildanê bingeha netewperweriya modern avêtibû û ev yek bi avabûna Komara Mahabadê dê xwe destnîşan bikira. Digel serhildana Şêx Ubeydullah divê mirov behsa Simko Axayê Şîkakî jî bike serhildana wî xwedî retorîkekî neteweyî bû; lê ew nexwedî hişmendiyeke bû ku bikara dewlet ava bikira; lewra nizanibû ka gelo demokrasî çî ye azadî û wekhevî çî ye. Haya wî jî van tiştên sereke tunebû (Kamali, 2005, r. 74-88). Di bingeha tevgera wî de eşîr hebûn herçend ew serxwebûnparêz be jî aliyê wî yê netewperweriya modern kêmbû. Lê digel van kêmasiyên xwe jî ew di nav netewperwerên kurdan de wekî lehengekî neteweyî dihate dîtin. Ew di sala 1930an dema de hate darvekirin, dewleta Îranê wisa difikirî ku di pêşiya navendîbûnê tu astengî nemabû (Vali, 2010, r. 33-38). Piştî ku ew hate darvekirin tevgera Barzaniyan li hember Iraqê ji aliyê leşkerî ve hin serkeftinan bi dest xistibû. Ev yek Mele Mistefa di nav kurdên netewperwer de navdar kiribû û tevgerên kurdan yê wekî Hêvî arikariya wî kir. Hêvî di nav kurdan de berbelav bibû û êdî îngilîz û hikûmeta Iraqê fêmkiribûn ku ew tevger ji eşîrî derketibû û bibû tevgerê netewî (Barzani, 2006, r. 92).

Ji vê astê şûn ve di navbera kurdan û Sovyetê de têkiliyeke erênî dest pê kiribû; lewra Sovyet ji bo gelên bindest weku hêzeke xilasker dihata dîtin û bi taybetî ji bo kurdên netewperwer weku hêviyek bû (Cemil, 1991, r. 161). Belkî jî yek ji sedema vê têkiliya erênî politikayên Sovyetê yê li hemberî kurdên Sovyetê jî bû; çimkî Sovyet mafên çandî û zimanî dabû kurdên navxweyî. Li Leningradê enstîtûyeke kurdolojî ava bibû. Serokê wê Î. Orbellî bû û di heman demê li Gurcistan û Azerbaycanê xebatên li ser kurdolojiyê dihatin kirin, ji ber vê yekê jî li vê derê gelek akademisyenên kurd perwerde dîtîbûn ku yek ji wan jî Rehîmê Qazî bû (Blau, 2017, r. 24-27). Helbet Sovyet hin amûrên propagandayê weku radyoya Erîvanê jî bi kar anî. Hejarê Şamil (2005) di nav vê pêwendê de dibêje ku Sovyet bi xêra van amûrên propagandayê li hêviyê bû ku şoreşa xwe di nav kurdên rojhilata navîn jî berbelav bike (r. 47). Dîsa Roosevelt (1991) îdia dike ku Sovyet soza serxwebûnê dida kurdan û kesên wekî Samand Siamandov ku bi esil kurd bû û di nav artêşa sor de cih girtibûn weku lehengê Leningradê îlan kiribû û bi vî awayî dixwastin alikariya kurdan bistîne (r.87). Ev yek helbet di nav kurdan de bû sedema hêviyê ku ew ê Sovyet kurdan biparêsta, di nav vê hêviyê de şert û mercên dîrokî pêl bi pêl rê dan ku Komara Mahabad ava bibe.

Piştî şerê Cihanê ya Duyemîn Îran hem ji aliyê Sovyetê hem jî ji aliyê Îngilîzan ve hate dagirkirin. Li Îranê netewperweriya kurdan li gor Tirkiyê û Iraqê qels bû; lêbelê ji ber ku Îran hatibû dagirkirin ew rewş rê da ku netewperweriya kurdî li vir geş be (McDowall, 2004, r. 231).

Hikûmeta navendî otorîteya xwe wenda kir û komeleya JK (Komeley Jiyanewey) ava bû. Ev komele bi alikariya gelek kom û kesên cuda ava bû; lê bi giştî weku komeleyeke netewperwer û mihafazekar xuya dikir (Minorsky, Bois û MacKenzie, 2004, r. 113). Endamê komeleyê bêtir ji çîna navendî û bajarî bûn, tenê du kes ji Iraqê bûn, yê din Mahabadî bûn. Paşê hin endamên komelaya Hêvî jî hatin vî derî (Qasimlo, 1991b, r. 29). A rast Komel weku li Azerbaycanê pir guh nedida çîna karker û gundiyan, komelê bêtir bi armancên netewperwer hewl dida di navbera çînan de hevalbendiyek ava bike (r. 33-34). Armanca bingeîn ya komeleyê bidestxistina serxwebûna gele kurd bû, ji bo vê armanca xwe pêk bînîn jî hin xebatên çandî û zimanî jî kirin (Kamali, 2005, r. 100-103). JK paşê bû IKDP û piştî vê veguhezînê kurdên xwedî erd û serokeşîr jî tevî vê tevgera netewî bûn (Aegleton, 1989, r. 141-142). Di vê navberê de ji deverên cuda jî kurd berê xwe didan Mahabadê ku yek ji wan kesan jî Mela Mistefa Barzanî bû. Ew di sala 1943an de derbasî Mahabadê bû; çimkî dixwest pirsgrîkên xwe yê bi hikûmeta Iraqê bi rêya rûsan çareser bike. Mele Mistefa di sala 1945an de bi rûsan re peywendî datîne û Sovyet soz dide wî ku ew ê kurdan li hember êrîşan biparêze (Barzani, 2006, r. 115). Barzanî di heman demê de di avabûna Komara Mahabadê de jî roleke sereke lîst (Vali, 2013, r. 47-48).

Weku Roosevelt (1991) îdia dike rûs ji sala 1942an ve ajanê xwe dişandin nav xaka kurdan; lê di sala 1945an de herêma êdî bi ajanê rûsan tije bibû ku yek ji wan jî Caferov bû. Ew bi cil û bergên kurdî di nav kurdan de digeriya. Lê li Mahabadê ajanên Abdullahov û Hacıov berpirsyar bûn û bi saya wan di navbera kurdan û Sovyetê de têkilî ava bûn. Heta dema ku Komel ava bû serok rêxistina paropagandayê ya Rûsya wekî mêvanê rûmetê hatibû vexwendin (r.69-70). Di destpêkê de wan arikariya kurdan kir; lê li vir mabesta wan bikaranîna kurdan li hember Turkiyê, Iran, Iraq û hêzên emperyalîstan bû (Jwaideh, 2009, r. 249). Di nav van şert û mercan de Komara Mahabadê bi tevkariyê kom û kesên cuda ve di sala 1946an avabû. Herçend di hişmendiya Qazî de dewleteke xodmixtar ku girêdayî Îranê ava bike hebe jî Komar weke dewletekê tev digeriya. Dibistanên kurdî û nexweşxane vebûn. Pirtûkên kurdî hatin çapkirin û weşangeriya kurdî geş bû û Komar biçûk be jî xwedî artêşekê bû. Vê komara biçûk bandor li ser hemû kurdan kir (Minorsky, Bois û MacKenzie, 2004, r. 114). Li gor Valî (2010) nasnameya kurdî bi saya Mahabadê şikl û şemal wergirt (r. 159-160).

Komar di destpêkê de serkeftî bû. Hem rewşenbîrên bajarî hem jî serok eşîran alîkarî dabûn û netewperweriya kurdî her ku diçû pêş ketibû. Rewşenbîrên vê serdemê weku serokê kurdan derketin pêş û bûn serokên netewperweriya kurdan. Bêgûman digel kêmasiyên xwe ew di netewperweriya kurdan de momenteke giring temsîl dike (Kamali, 2005, r. 122-125). Lê di vê navberê de kurdan baş dizanî ku ji bo ku Komar li ser linga bimîne arikariya Sovyetê giring bû.

Di nav vê çarçoveyê de digel ku kurdên Mahabadê ji aliyê îdeolojîk ve ne marksîst bûn jî propagandayê Sovyetê dikirin (Aegleton, 1989, r. 240). Bo nimûne Hejar di kongreya IKDPê de helbestek xwendibû ku tê de pesnê Sovyetê û artêşa sor dihat kirin (Emin, 2019, r. 98)

Lê herçend ku kurd dixwestin ku arikariya Sovyetê bistînin jî ne wan ji Sovyetê bawer dikir ne jî Sovyet bi wan bawer dikir. Polîtîkayên Sovyetê yên li hemberê kurdan ne zelal bûn, pêşiyê kurdan teşvîk kirin û çekan dan wan; lê çekên giran nedan wan (Aegleton, 1989, r. 178). Ev rewş bû sedem ku popularîtaya Sovyetê di nav kurdan de bilind bibe. Ewqas bilind bibû ku dema ku Komar ber bi têkçûne ve jî diçû li her malê hema bibêjin wêneyê Stalîn hebû (Aegleton, 1989, r. 238). Lê di dawiyê de di navbera Sovyetê û Îranê de hevpeymanî Tahranê pêk hat û Îranê mafê derxistina petrole da Sovyetê (Qasimlo, 1991b, s. 35). Jixwe pir neçû jî ber ku tu hêviya wan ji komarê tunebû, lewra Sovyet vekşiya. Hêviyê kurdan şikiyabûn û ji bo cara dawî hewl dan ku bi Amerikayê hevdiîtinan pêk bînin. Serbaz Roosevelt hate Mahabadê, kurd ji bo ku bala wî bikşînin gelek hewl dan, lê bi ser neketin. Qazî daxwaz jê kir ku ew arikariya tevgera netewî ya kurdan bike, lê wî tu berjewendî di vî karî de nedidît (Aegleton, 1989, r. 250-252). Sovyeta ku ji bo gelên bindest sembola azadiyê bû, ji bo kurdên Mahabadê bibû sedema hêviyên têkçûyînê. A rast Sovyet jî dev ji vê îmajê xwe berda û gelên bindest tenê ji bo berjewendiyê xwe bi kar dianî. Bo nimûne di sala 1955an li bajarê Bandungê konferansê pêk hat. Armanca sereke ya konferansa zeximkirina hevalbendiya têkoşîna antîkolonyal bû. Kesên ku tevî vê konferansê bûn digel Amerikayê Sovyetê jî suçdar kirin; lewra li gor wan Sovyet jî êdî wek hêzeke emperyal tevdigeriya û gelên biçûk ji bo berjewendiyên xwe bi kar dianî. Wan Sovyetê weku hêzeke neo-kolonyal pênase kirin (Ashcroft, Griffiths û Tiffin, 2013, r. 23). Bi vî awayî tîkiliyên di navbera gelên cîhana sêyemîn û Sovyetê jî xera bû. Ji bo kurdan jî ev yek derbasdar bû. Bi taybetî di bûyera Komarê de ne ku gelê Mahabadê û rewşenbîrên kurdan ji marksîzmê bawer dikirin; lê dizanibûn ku piştgiya Sovyetê werbigirin gotara lenînîst bi kar dianîn. Lêbelê herdu alîyan jî ji vê yekê ji dil bawer nedikirin.

Digel van nîqaşan di serdema Komarê de jî aliyê çandî ve gelek berhemên hêja hatin çapkirin. Bo nimûne weku kovarên Kurdistan, Nîştîman, Halala û Hawar. Piyes hatin nivîsîn û hatên lîstîn li vî derî atmosfereke çandî û rewşenbîrî ava bû ku kesên wekî Hêmin, Hejar, Rehîmê Qazî di vî warî de kesên sereke bûn. Rehîmê Qazî ku nivîskarê romana Pêşmerge bû di heman demê de merivê Qazî Mihemmed bû. Wî di dema avakirina Komarê de gelek ked da û bi awayekî aktîf tevî tevgerên sîyasî bû. Rehîmê Qazî piştî hilweşandina Komarê mecbur ma ku berê xwe bide Sovyetê, wî li vir jiyana xwe berdewam kir, lê di heman demê de herdem xweziya xwe bi rojên ku komar ava bû dianî û bi wê hesretê dijîya û bi wê mabestê romana Pêşmerge

nivîsand (Uzun, 1992, r. 59-60). Wî hem teza xwe ya doktorayê li ser pêvajoya avabûna Komara Mahabadê kir û hem jî derbarê vê pêvajoyê de di romana xwe Pêşmerge de behsa pêvajoya avabûna Komarê kir. Gelo ew di vê romanê de çiqas sadiqê bûyerên dîrokî mabû ka em lê binêrin.

3. Kurd, Gundî û Karker Têkiliyên Netewperwerî Çînî di Pêşmerge de

Roman bi şeweyeke realîzma sosyalîst hatiye nivîsandin ku em ji mêj ve aşînayê vê yekê bûn; lewra romanên li Sovyetê hatibûn nivîsandin jî bi vî rengî bûn (bnr.Ergün, 2023). Realîzma sosyalîst polîtîkaya fermî ya Sovyetê bû û Rehîmê Qazî jî ji ber ku di nav vê xakê de dijiya mecbur bû ku li gor vê edebiyatê binivîsanda. Ji ber ku li gor Lenîn (1990) mirov nikare behsa edebiyateke azad bikirina yên ku herî zêde edebiyata azad diparêzin yên ku girêdayî edebiyata burjûvazi ne. Dema ku edebiyat ji nav destên komên elît bihata derxistin û bigihişt a civak encex dikaribû azad bibûna (r. 8-11). Wekî Williams (1990, r. 158) jî îfade dike, nivîsandin li gor marksîzmê sefgirtina li kêleka hin îdeolojiyan e û helbet marksîstek jî divê li kêleka çîna karker û gundiyan sefa xwe bigirtana (r. 158).

Kêm zêde realîzma sosyalîst jî li ser van esasan şîn bû. Edebiyat divê pesnê çîna karker û gundiyan bidana ku em vê yekê ne tenê di edebiyata Sovyetê de di heman demê li Tirkîyê û li Rojava jî dibînin. Bo nimûne romana Gundikê Dono ya Mahmut Baksî (2018) û novelaya Reşoyê Darê ya Cegerxwîn (2007) berhemên bi vî rengî bûn. Weku van romanên navborî di Pêşmerge de jî em hêj di destpêkê de rastî zilm û zordestiya axayan tên. Di gotara marksîst de herçend çîna karkeran hêza sereke ya tevgera marksîst be jî gundî jî hevalbendê karkeran bûn. Jixwe di nav welatên Sovyetê de jî karker bêtir gundî bûn. Li gor Lenîn (1997, r. 46-47) divê di navbera van herdu çînan de hevalbendiyek ava bibûna; çimkî gundî jî wekû karkeran di heman rewşî de bûn, ew jî mecbûr bûn ku bacê bidin serokên feodal. Herçend gundî hin caran mafê bikaranîna erd bi dest bixistana jî nikaribûn bibûna xwedî erd û beg bi awayekî hêsanî dikaribûn dest danîna ser keda gundiyan (Bottomore, 1993, r. 222). Li Kurdîstana Îranê jî rewş wiha bû, serokeşîr li ser gundiyan xwedî otorîte bûn. Ew xwedî erd bûn û gundî jî wextê çînîna erdan bacê didan wan (Qasimlo, 1991b, r. 20-21). Di Pêşmerge de ev gotar bi vî awayeke aşkere xuya dibe. Bo nimûne hemû erd û mal û milk yên Qerenî axa ne û ew gundiyan dişelîne. Di rastiya xwe de Qerenî Axa karakterekî dîrokî bû, kurê wî Mam Azîz dijminatîya Qazî dikir (Roosevelt, 1991, r. 89).

Kesên wek Kek Mamend ku bavê karakterê sereke Pîrût bû ji ber zilm û zordariya Qerenî Axa ax û azar dikişîne (Qazî, 1997, r. 7-8) rewşa wî her ku diçe bêtir xerab dibe, sala reş li ser serî wî tê nikare deynê axa bide, lê gunehê axa bi wî nayê. Ew bêçare bû, lê dîsa jî li ber axa

nedixwast ku serî bitewîne. Ew îtiraz dike, lê axa bêtir dixeyide û jê re dibêje gelo tu bi yetîmê xwe yê Seblaxê (Mahabad) ku bûye pêşmerge bawer dikî:

Ez nahêlim ew çî û warên ku ji bab û bapîrên me ji me re mane ji biyaniyekî rût re bên dan. Kurmanc çî ye ku di muqabilê axayê xwe de xwe însan hesêb bike? Kurmanc çî ye ku bêje ez jî heme... (Qazî, 1997, r. 9).

Weku ji wir xuya dibe ku kurmancbûn di gotara axa de bi gundîtî ve hatiye girêdan. Herçend axa bi xwe jî kurd be dîsa ew gundiyan wekî kurd dibîne; lewra ew bêtir bi desthilatdaran re kar dike. Li vir dîsa em rastî gotarek lenînîstî tî. Bo nimûne li gor Lenîn (2016, r. 34) di sîstemên kapîtalîst û burjûva de di navbera begên feodal û karmendê dewletê de hevalbendiyek xurt heye. Devlet di van pergalan de tenê amûreke pêkûtiyan e. Leşkerên ku peywira wan parastina gel e, beravajiya vê yekê li kêleka begên feodal cih digirin û zext û zordariyê li ser gel dikin. Qerenî Axa hevalbendê dewleta Îranê ye, şevek fermandarê cendirmeyan tê ba wî ji bo wî îzzet îkram dike û dîwan digerin û qûmarê dilizîn. Qerenî Axa ji Hemê Çevre dixwaze ku straneke şîkakiyan bibêje, lê dinêre ku serfermandar ji vî zimanî hez nake û Qerenî Axa ji nişka ve wî dide sekandin. Ew bi serfermandar hewl dide ku bi farisî biaxeve û îspat bike ku farisiya wî çiqas baş e, lê di vê yekê de jî bi sernakeve, kurdî û farisî têkilhev dike (Qazî, 1997, r. 14-18). Li Îranê zimanê kurdî qedexe bû û ji ber vê jî zarokên kurdan mecbûr diman ku di dibistanan de farisî hîn bibin (Qasimlo, 1991b, r. 15). Pirzimanî encama mecbûrî ya rewşa kolonyal e; çimkî gelên ku hatine kolonîzekirin ji bo ku tevli jiyana civakî bibin mecbûr in ku ji bilî zimanê dayika xwe divê zimanê fermî jî hîn bibin. Ji ber ku ew wisa hîn bûne ku zimanê wan têrî zanist û perwerdeyê nake (Memmi, 2003, r. 151-153). Li vir jî nivîskar hewl dide nîşan bide ku zimanê kurdî li ba serdestan ne zimanê muteber e.

Nivîskar bi hemû awayî Qerenî Axa û serok cendirmeyan neyînî teswîr dike. Qerenî Axayê ku li hember Kak Mamend bibû gurê har li hember serfermandar bibû mîna pisikan. Serfermandar jê re dibêje tu ehmeq î, ji gundê te 25 kes çûne Mahabadê û bûne pêşmerge, lê tu li vir amadekariya nêçîrê dikî. Li Mahabadê kurd bûne xwedî desthilatdar û rojnameyên kurdî derdixin dema ku ew werin vir ew ê te bikujin; lewra ew navê te wekî kesekî welatfiroş û xayîn nivîsandine. Qerenî Axa yek ji wan kesan bû beravajî piraniya Kurdistanê digel sed siwariyên xwe xulamtiya hikûmetê hîlbijartibû û çend caran jî hereketa gundiyan jî gulebaran kiribû û bi hikûmeta îngilîzan jî kar dikir. Ew bi her awayî hewl dide ku pêşiya kurdên welatperwer bigire; lewra ji serfermandar dibêje ku du sal berê kurdên Pabûrehnan hewl dan li van deran Komele (JK) ava bikin, lê wî rê nedaye wan û du kes ji wan girtiye. Ji ber vê jî tevahiya gundiyan ji wî ditirsiyan, ew amadeye ku bi piştgiriya Amerîkayê pêşmergeyên rût bikuje. Serfermandar ne

wekî wî di heman baweriyê de ye; lewra dibêje ku par ne pêrar ew pêşmergeyên rût tanken ordiya Şah bê kêr kirine (Qazî, 1997, r. 17-20).

Di vê navberê de Qazî karekî baş dike û hemû eşîran li hev tîne, ew bi siwarî û çekên xwe tevli pêşmergeyan dibin. Ji Iraqî Barzaniyên ku dijminê îngilîzan jî di nav de gelek kurd berê xwe didin Mahabadê û tevli pêşmergeyan dibin. Di nav van kesan de kevneleşkerên mîna Izzet, Mustefa Xoşnav, Xeyrullah û Mihemed Mehmûd jî hene ku ew di qadên xwe de gelek şareza ne. Di nav nîqaşa Qerenî Axa û serfermandar de behsa Pîrûtê kurê Kek Mamend dike. Li gor serfermandar ew mirovekî bêtirs û çavsor e ku paşê ew ê jî tevli nava refê pêşmergeyan bibe (Qazî, 1997, r. 20-21). Pîrût wekî tîpekî îdeal derdikeve pêşberî me ku tîpên bi vî rengî di nav edebiyata realîzma sosyalîst de gelek caran derdikevin pêşberî me. A rast di edebiyatê de avakirina tîpan cara ewil ji hêla Taîne hatibû bikaranîn. Hin tîp binyada kûr ya xwezeya mirovahiyê temsîl dikin. Rexnegîrê marksîst Lukács vê têgêhê ji Hegel standibû. Li gor Hegel qehremanekî gerdûnî hebû û ew ji bo armanca Geist (ruh) pêk bînê dê têbikoşiyana. Ev têgeh ji hêla marksîstan hinek hate guherandin. Di gotara wan de mirovê gerdûnî ku armanca Geistê ew ê pêk bînê weku tîpekî îdeal ê proleterya bû ku ew heman demê de şoreşger jî bû. Di realîzma sosyalîst de ev tîpê îdeal temsîliyeta mirovê pêşerojê dike (Williams, 1990, r. 81-8). Em di nav edebiyata Sovyetê de gelek caran rastî tîpên bi vî rengî tên, bo nimûne karakterê sereke di romana Мать (Dayîk) ya Gorkî de Pavel an jî di romana Jiyana Bextewar a Erebe Şemo de Misto û Emerê Şehîd tîpên wisa bûn ku ew karakteran di dawiyê de ew û bibûna şoreşger (Ji bo berawirdkirinek di navbera Gorkî û Şemo de bnr (Yılmaz, 2021). Di romana Pêşmerge de jî Pîrût karakterek wisa ye, ew ê wek tîpeke îdeal derkeve pêşberî me ku ew paleyeke di bin zilma axayan de bû; lê beravajî weku romanên navborî ew ê berdila bibûna şoreşger, bibûna Pêşmerge da ku welatê xwe ji bin nîrê zordariya hikûmeta Îranê derxistana. Lewra ew di romanê de weku lehengekî îdeal tê pêşkêşkirin (Qazî, 1997, r. 22).

Pîrûtê ku evîndarê Mirût bibû û amadekariya xwestina wê dike, lê Mîne Axa dikeve navbera wan. Ew mirovek 50 salî, zikmezin, pozmezin, çevbeloq, devxwar û xwedî çar jinan bû, lê dîsa jî têr nedibû. Bi gelek jinan re dizewicî û wan berdide paşê jî ji bo ku kes bi jinên wî yê berdayî nezewice xulamên xwe bi wan re dizewicand. Ew jî dixwaze bi Mirût re bizewice, lê birayê Mirût Şerko ji vê yekê razî nabe. Mîne Axa bi hileyêke Mirût dikişîne nav daristanê û li vir dest diavêje namûsa wê û dibêje tu ne layiqî kurmançekî genî yî! Piştî vê bûyere ji ber ku ew keça kurd e û keçên kurd xwedî namus û şeref in xwe bi darve dike (Qazî, 1997, r. 30-38).

Şerko û Pîrût fêr dikin ku Mîne Axa wî kare qirêj kiriye. Di vê navberê de Artêşa Îranê berbelav dibe û ew jî çekên ku li artêşê li pey xwe hiştine bi dest dixin. Ew kemînek li hember

zabîten Îranê vedan. Li gor Pîrût ev zabît ji bili xerabî û dijminatîyê pê ve tu tiştek ji gelê Kurdistanê nekiribûn. Ev artêş bû ku ciwanên kurdan bi darê zor dibir leşkeriyê û ji ber ku ew kurd bûn û farisî nedizanîn zilm û zordestî li ser serê wan dikirin. Ew û çend hevalên xwe leşkerên Îranê dikujin û çekên wan hildigrin. Çalakiya wan nav û deng dide, ew Komeleyê (JK) nas dikin. Komele jî wekî wan dijminê axa û rejîma Îranê bû ku dê Komelê gelê kurd azad bikira (Qazî, 1997, r. 49-55). Pîrût edî bi kirinên xwe ber bi şoregeriyê ve diçe ew di wê baweriyê de ye ku çarenûsa kurdan tenê bi tivingê pêkan e (r. 55). Em vê yekê hem ji gotara marksîst hem jî ya dijkolonyal de jî dibînin. Bo nimûne piştî Şoreşa Cotmehê Bolşevîk di wê baweriyê de bûn ku ji bo çîna karkeran şidet tekane rê bû û kulakan (begên çewlikan) ji ber vê yekê kuştin (Bookchin, 2013, r. 336). Di heman demê de ji bo kesên wekî Fanon (2007, r. 34-35) jî çarenûsa gelên bindest encex çekhilanîn e; lewra tenê hêza çekê ew ê biryar bide ka ew ê kî bibe efendî û jî kole. Di nav vê çarçoweyê de di nav romanê de herçend hin axayên baş hebin jî dewleta Îranê ew sirgûn kirine (Qazî, 1997, r. 50). Ji aliyê dîrokî ve jî ev rast e çimkî gelek eşîrên wekî Celalîyên ku li ser sînorê Tirkîyê dijiyan ji hêla hikûmeta Îranê bi darê zorê hatine îşkankirin (Qasimlo, 1991b, r. 22). Lewra Şerko û Pîrût di wê baweriyê de bûn ku kurd tenê bi hêza çekê dikaribûn rizgar bibûna. Wan kemînek ji bo Mîne Axa veda, agir bi erdê wî dixin dema ku ew hemû xulamên wî bi tefandina agir ve mijûl dibin wî desteser dikin û weku ku wî Mîrût bi darve kiribû û ew jî wî bi dar ve dikin (r. 67). Pîrût piştî kuştina Mîne Axa dibêje ku ez xulamtiyê ne jî Mîna Axa ne jî Şah re dikim (r. 70).

Pîrût û Şerko paşê ji bo alikariyê diçin ba Mîrza Qutas ku ew jî weku kesekî zana tê teswîrkirin. Di heman demê de gelek ji sîstema dewletê aciz e, li gor wî karmend û desthilatdarê dewletê li hember ziman û çanda kurdan gelek caran bêrûmetiyê dikin û helbet axayê ku xwîna vî milletî dimijîn jî dijminê gel in. Wî jî ji bo rizgariya Kurdistanê berê xwe daye Mahabadê û bûye endamê komaleya JK. Mîrza Qutas ji wan re dibêje ku Komel jî bo serxwebûna kurdan kar dike û ji ber vê yekê divê ew tevî Komeleyê bibin ew jî vê pêşniyarê qebûl dikin (Qazî, 1997, r. 72-75). Herdu jî dibin endamê Komeleyê û navên kod Azer û Bira ji xwe hiltînin (r. 79). Komel her ku diçe mezin dibe û endamên xwe ji bo armanca komeleyê berbelav bikin li deverên cuda yên Kurdistanê dişînin. Axa jî ji bo gundî tevî Komelê nebin zilm û zordestiye dikin, heta hin axa guhê gundiyekek kurmanc jê dikin (r. 80). Di çavê Komeleyê de Şerko û Pîrût bûne qehreman û nav û dengê wan berbelav dibe; lewra wan hem Mîna Axayê ku karên qirêt dikir û hem jî cendirmeyan dewleta Îranê kuştine (r. 83). Piştî ku ew tevî Komeleyê dibin li vir Qazî Muhammed nas dikin. Qazî erê serok bû, lê mirovek dîlnizm bû, weku kesekî ji rêzê tev digeriya (r. 93). Pîrût dibe serokê pêşmergeyan û bi zanebûn û qehremaniya xwe derdikeve pêş û ji ber

vê yekê jî Qazî bi taybetî wî pîroz dike (r. 97). Komar her ku diçe mezin dibe, bihêz dibe û dibe çira ji bo parçeyên din yên Kurdistanê (r. 100). Komar dixwaze Seqizê jî bi dest bixe, lê artêşa Îranê rê nade. Kesên weku Qerenî Axa jî ligel artêşê li hember Komeleyê şer dikin (r. 103). Pîrût ji bo ku emrê Qazî bi cih bîne digel pêşmergeyan berê xwe dide Seqizê û Kanisewzeyê welatê bav û kalan. Ew ji wir weku xulamê derketibû, lê niha wekî Pêşmergeyekî vedigeriya (r. 104). Qerenî Axa digel Jandermeya Kek Mamend dikuje û dibêjê kurmanç nikarin li ber axayê xwe bipeyivin (r. 106). Pêşmerge xwe digihîn Kanisewzê, lê Qerenî Axa û cendirmeyan cilê pîrekan li xwe dikin û ber bi Tehranê ve diçin (r. 109). Divê were gotin ji aliyê dîrokî ve jî gelek serok eşîrên dev ji xaka xwe berdabûn û çûnbûn, Komele erdê wan li gundiyan belav kiribû (Qasimlo, 1991b, r. 31).

Lê ji vê astê şûn ve çî çêbû, çî hat serê Komeleyê nivîskar venabêje; lewra têkçûna Komarê rasterast bi Sovyetê re girêdayî ye ku wisa dixuye ku nivîskar li vir otosansûr kiriye. Ji ber ku desthilatdariya îdeolojîk gelek caran bandor li ser edebiyatê dike, hin caran ev rê dide otosansûrê; lewra nivîskar mecbûr dimînin ku otokontrolê ava bikin. Bi taybetî di desthilatdariyê sosyalîst de sîstema kontrole ya li ser edebiyatê bi awayekî aşkere dihate meşandin (Sapiro, 2019, r. 51-52). Wisa dixuye ku nivîskar jî ji vê yekê xalî nemaye û nexwestiye behsa rola Sovyetê di têkçûyîna Komarê de bike. Lewra mirov dikare bibêje ku nivîskar rastiyan dîrokî li bêjîngeke xwestiye ji ber çavan derbas kiriye û wiha pêşkeşî xwîner kiriye. Wekî peyva dawî mirov dikare bibêje ku cudahiya sereke ya vê romanê ji romanên Sovyetê ew e ku nivîskarên Sovyetê, di serî de kesên wekî Erebe Şemo, Sovyetê wekî welatê xwe didîtin; lê di vê romanê de nivîskar welatekî serbixwe ji bo kurdan dixwaze ku ev welat divê li ser çîna karker û gundiyan ava bibûya.

ENCAM

Di vê xebatê de hate destnîşankirin ku beriya avabûna Komara Mahabadê di navbera netewperweriya kurdan de û lenînîzmê hevalbendiyek ava bibû. Bi taybetî jî ji ber ku piştî Şerê Cihanî yê Duyemîn Sovyet weku hêzeke super derketibû holê kurd jî dixwestin arîkariya vê hêzê werbigirin û jixwe avabûna Komara Mahabadê jî beranberiya vê dirokî tê. Rehîmê Qazî jî yek ji wan kesan bû ku şahidiya vê serdemê kiribû û bi saya romana Pêşmerge xwestibû behsa vê serdemê bike. Di encama vê xebatê de hate dîtin ku wî xwestiye ku kurdbûnek ava bike ku di bingeha wî de gundîti û paletî heye. Ev yek hem li gor serdemê û hem jî sîstema ku ev tê de dijiya guncaw bû. Lê bi qasî ku metnek behsa çî dike, behsa çî nake jî giring e. Lewra Qazî di vê romanê de behsa hin bûyerên dîrokî nekiriye û otosansûr kiriye. Herçiqas di avabûna Komarê de rola Sovyetê hebe jî di heman demê de sedema sereke ya têkçûyîna Komarê dîsa Sovyet bû.

Eger em ji aliyê sosyolojiya edebiyatê ve binêrin di vê romanê de bûyerên dirokî rastrast nehatiye vegêran; berevajî wê ji çavekî îdeolojîk hatine dîtin ku ew yek jî bûye sedem ku di navbera gotara romanê û bûyerên dirokî de hin nakokî derkevin holê.

ÇAVKANÎ

- Aegleton, W. (1989). *Mehabad Kürt Cumhuriyeti 1946*. (Wer. M. E. Bozarslan). Komkar.
- Anderson, B. (2006). *Imagined communities: reflections on the origin and spread of nationalism*. Verso.
- Ashcroft, B., Griffiths, G., & Tiffin, H. (2013). *Postcolonial studies the key concepts*. Routledge.
- Baksi, M. (2018). *Gundikê Dono*. Lîs.
- Barzani, M. (2006). *Barzani ve kürd ulusal özgürlük hareketi*. (Wer.V. İnce,). Doz Yayınları.
- Blau, J. (2017). Kürd edebiyatı. Di nav A. Keskin (Ed.), *Kürt edebiyatı* (Wer. H. Bucak).11-40). Avesta
- Bookchin, M. (2013). *1905'ten 1917'ye rus devrimleri*. (Wer. A. İ. Başgöl). Dipnot Yayınları.
- Bottomore, T. (1993). *Marxist düşünce sözlüğü*. (Wer. M. Tunçay). İletişim.
- Bourdieu, P. (1995). *The rules of art genesis and sturcture of the literary field*. (Wer. S. Emanuel). Stanford University Press.
- Bruinessen, M. V. (2005). Kurdish society, ethnicity, nationalism and refugee problems. Di nav P. Kreyenbroek, & S. Sperl (Eds.) , *the kurds a contemporary overview* (s. 26-53). Routledge.
- Calhoun, C. (2007). *Milliyetçilik*. (Wer.B. Sütçüoğlu). İstanbul Bilgi Üniversitesi.
- Canovan, M. (1996). *Nationhood and political theory*. Edward Elgar.
- Carr, E. H. (1990). *Milliyetçilik ve sonrası*. (Wer. O. Akın). İletişim.
- Cegerxwîn. (2007). *Reşoyê Darê*. Lîs.
- Cemil Paşa, K. (1991). *Doza kurdistan(kürdistan davası), kürd milletinin 60 yıllık esaretten kurtuluş savaşı hatıraları*. M. Bayrak (Ed.). Özge.
- Chatterjee, P. (1993). *Nationalist thought and the colonial world a derivative discourse*. Zed Books.
- Connor, W. (1973). The politics of ethnonationalism. *Journal of International Affairs*, 1-21.
- Culler, J. (2007). *Yazın kuramı*. (Wer. H. Gür). Dost.
- Eagleton, T. (1998). Two approaches in the sociology of literature. *Critical Inquiry* (14), 469-476. <http://www.journals.uchicago.edu/t-and-c>
- Eagleton, T. (2014). *Marksizm ve edebiyat eleştirisi*. (Wer.U. Özmkas). İletişim Yayınları.
- Eastwod, J. (2007). Bourdieu, Flaubert, and the sociology of literature. *Sociological Theory*, 25(2), 149-169.
- Edmonds, C. J. (1971). Kurdish nationalism. *Journal of Contemporary History*, 6(1), 87-107.
- Emin, N. M. (2019). *Sovyetlerin oyunları karşısında kürdistan hükümeti*. (Wer.M. Ronahi, & Özdemir Mühsin). Dara.
- Ergün, Z. (2023). *Edebiyata kurdi ya sovyete*. Nûbihar.

- Escarpit, R. (1992). *Edebiyat sosyolojisi*. (Wer. H. Portakal). İletişim.
- Esposti, D. N. (2022). *Nation and class in the history of the kurdish movement*. Switzerland: Palgrave Macmillan. doi:<https://doi.org/10.1007/978-3-031-10247-9>
- Fanon, F. (2007). *Yeryüzünün lanetlileri*. (Wer. L. F. Topaçoğlu). Avesta.
- Fanon, F. (2009). *Siyah deri beyaz maske*. (Wer.C. Koytak). Versus.
- Gans, C. (2003). *The Limits of nationalism*. Cambridge University Press.
- Gellner, E. (1992). *Uluslar ve ulusçuluk*. (Wer.G. G. Büşra Ersanlı Bahar). İnsan Yayınları.
- Goldmann, L. (1967). The sociology of literature: status and problems of method. *International Social Science Journal*, 19(4), 493-517.
- Goldmann, L. (1998). *İnsan bilimleri ve felsefe*. (Wer. A. Timuçin, & Füsün Aynuksa,) Toplumsal Dönüşüm Yayınları.
- Goldmann, L. (2005). *Roman sosyolojisi*. (Wer. A. Erkay,). Birleşik.
- Griswold, W. (1993). Recent moves in the sociology of literature. *Annual Reviews of Sociology*, 455-467.
- Habermas, J. (1994). Struggles for recognition in the democratic constitutional state. Di nav A. Gutmann (Ed.) *Multiculturalism examining the politics of recognition* (Wer. S. W. Nicholse, s. 107-149). Princeton University Press.
- Hobsbawm, E. J. (2010). *Milletler ve milliyetçilik*. (Wer. O. Akınhay,). Ayrıntı.
- Hoggart, R. (1966). Literature and society. *The American Scholar*, 35(2), 277-289. <https://www.jstor.org/stable/41209369>
- Jwaideh, W. (2009). *Kürt milliyetçiliğinin tarihi kökenleri ve gelişimi*. (Wer. İ. Çekem, & A. Duman,) İstanbul: İletişim Yayınları.
- Kamali, F. K. (2005). The development of nationalism in iranian kurdistan. Di nav P. Kreyenbroek, & S. Sperl (Ed.), *The kurds a contemporary overview* (135-152). Routledge.
- Kedourie, E. (1961). *Nationalism*. Hutchinson Universty Library.
- Khon, H. (1982). *Nationalism its meaning and history*. Robert E. Krieger Publishng Company.
- Kösemihal, N. Ş. (2014). Edebiyat sosyolojisine giriş. *İstanbul University Journal of Sociology*, 2(19-20), 1-37.
- Laurenson, D., & Swingewood, A. (1972). *The sociology of literature*. Shocken Books.
- Lenin, V. İ. (1990). *Proletarya kültürü*. (Wer. N. R. Çobanoğlu). Yar Yayınları.
- Lenin, V. İ. (1992). *Ulusların kaderlerini tayin hakkı*. (Wer. M. Erdost). Sol Yayınları.
- Lenin, V. İ. (1997). *İşçi sınıfının emekçi köylülükle ittifakı üzerine*. İnter Yayınları.
- Lenin, V. İ. (1976). *Emperyalist Savaş Üzerine*. A. Yurdaer (Çev). İstanbul: Günce Yayınları..
- Loomba, A. (2000). *Kolonyalizm postkolonyalizm*. (Wer. M. Küçük). Ayrıntı.
- Lukács, G. (2014). *Roman kuramı*. (Wer. C. Soydemir). Metis.

- McDowall, D. (2004). *A modern kurdish history of the kurds*. Palgrave Macmillan.
- Memmi, A. (2003). *The colonizer and the colonized*. (Wer. H. Greenfeld). Earthscan.
- Miller, D. (1995). *On nationality*. Clarendon Press.
- Minorsky, V., Bois, T., & MacKenzie, D. N. (2004). *Kürtler & Kürdistan*. (Wer.K. Fıratlı). Doz.
- Özoğlu, H. (2004). *Kurdish notables and the ottoman state evolving competing loyalties, and shifting boundaries*. State Universty of New York.
- Pincott, R. (1970). The sociology of literature. *European Journal of Sociology*, 11(1), 177–195. doi:https://doi.org/10.1017/S0003975600002034.
- Plekhanov, G. V. (1967). *Sanat ve sosyalizm*. (Wer. S. Mimoğlu). Sosyal Yayınları.
- Qasimlo, A. (1991a). *Kurdistan û kurd lêkolînek sîyasî û aborî*. (Elîşêr, Wer.). Jîna Nû.
- Qasimlo, A. (1991b). *Îran Kürdistanı*. Belge.
- Qazî, R. (1997). *Pêşmerge*. (Wer. Z. Avcı). Nûdem.
- Rattanası, A. (2007). *Racism a very short introduction*. Oxford University Press.
- Roosevelt, A. (1991). Mahabad Kürt Cumhuriyeti. Di nav, A. Qasimlo, *Îran Kürdistanı* (65-95). Belge.
- Saîb, C. (2009). *Di Xew De*. (Wer. Z. Avcı). Avesta.
- Said, E. W. (1993). Yeats ve sömürgeleşme. Di nav T. Eagleton, F. Jameson, & E. W. Said (Eds.) *Milliyetçilik, sömürgecilik ve yazın* (Wer. Ş. Kaya), (65-90). Kabalcı.
- Said, E. W. (2016). *Kültür ve emperyalizm*. (Wer. N. Alpay). Hilyayın.
- Sapiro, G. (2019). *Edebiyat sosyolojisi*. (Wer. E. C. Gürçan). Doğu Batı.
- Smith, A. D. (1991). *National identity*. Penguin.
- Stalin, J. (1979). *Leninizmin ilkeleri*. (Wer. M. Erdost). Sol Yayınları.
- Şamil, H. (2005). *Diaspora kürtleri*. Peri Yayınları.
- Şatıroğlu, A. (2012). Edebiyat sosyolojisi. *İstanbul University Journal of Sociology*, 3(11), 173-177.
- Uzun, M. (1992). *Destpêka edebiyata kurdî*. Beybûn.
- Vali, A. (2010). *Kürdistan Cumhuriyeti, İran'da kürt kimliğinin oluşumu*. (Wer. Z. İnanc). Avesta.
- Vali, A. (2013). *Kürt tarihi kimliği ve siyaseti*. (Wer. İ. Bingöl). Avesta.
- Váňa, J. (2020). Theorizing the social through literary fiction: for a new sociology of literature. *Cultural Sociology*, 14(2), 180-200.
- Watson, H. S. (1977). *Nations and states, an enquiry into the origins of nations and politics of nationalism*. Universty Printing House, Cambridge.
- Williams, R. (1990). *Marksizm ve edebiyat*. (Wer.E. Tarım). Adam Yayınları.

Yılmaz, F. (2021). *Dasa şemo û çakûça gorkî xwendineke berawirdkî li dor şivanê kurmanca û sêbareya gorkî*. Peywend.